# BIZANE KU ÇI DERBAS DIBE MENDEHOŞÎ Û XETER



## Li navenda lêhûrbûnê: **Gaza kenê**

| | |
|---|---|
| Made | • Gaza bê reng bi bêhna şîrîn.<br>• Bikaranîna sereke:<br>◦ Li pîşesaziyê wek madeya kîmyayî ya labratuwarê û li berhemanînê,<br>◦ Di pîşesaziya madeyên xwarinî de wek madeyê kefker ji bo xameyê hatiye lêdan,<br>◦ wek gaza palder di qutiyên spreyê,<br>◦ Di bijîşkiyê de ji bo kêmkirina êşê û rewşên bûhedariyê.<br>• Gaza kenê nemaze li nav kesên ciwan û xort hezkirî ye, ji ber ku bihayê kepsolan guncan û bandora wan demkurt e. |
| Awayê bikaranîn & Bandor | • <u>Teşeya bikaranînê:</u> pirrî wek kepsolên gazê tê kirrîn.<br>• Gaza kenê rasterast ji kepsoleke gazê yan ji bafirrokekê (ballon) tê bikaranîn.<br>• <u>Bandor:</u> Mendehoşî bo heyama çend çirkeyan heta herî zêde 2 deqeyan<br>◦ Hesta germaya nexweş<br>◦ Hesta derzî derzîbûn û zeqbûnê ku ji hêla bikarhêneran ve wek xweş tê zanîn<br>◦ Hestên kêfxweşiyê<br>◦ Dibe ku bibe sebeba wehmê.<br>• Ji ber bandora demkurt a gaza kenê, xetere pirranî kêmast tên dîtin. |
| Bikaranîna hevdudanî | • Bikaranîna hevdudanî dibe ku dûhatê nerênî yên zehf li dû xwe bîne.<br>• Dûhat dibe ku ji ber madeyên cûrbicûr guherbar bin.<br>• Dûhatên gengaz ev in: Germixîn, bandora wehmhêner, bêhnçikiyan, daketina zêde ya zexta xwînê, daketina gefxwera jiyanê ya gihandina oksîjenê li mejî, rewşa dilrabûnê, vereşîn. |
| Destebendiya Qanûnî | • Di dema niha de (10.2025) gaza kenê li Almanyayê hîn jî madeyeke qanûnî ye. Ji ber vê yekê kirrîn, hilgirtin û bikaranîna wê rêpêdayî ye.<br>• Di Tîrmeha 2025an de pêşnivîsa qanûneke nû hatiye raberkirin ku biryar e bikaranîn û hilgirtina gaza kenê ji nû ve bide nasandin.<br>• Qedexetiya kirrîn û hilgirtinê ji bo zarok û nûciwanan tê sepandin.<br>• Ji bilî vêya kirrîn bi rêya amûrên firotina automatîk û herwiha bi rêya kirrîn û firotina postî qedexe ye. |

PRO Langenhagen

Ev belgeya ragihandinê ji aliyê Konseya Şopandinê ya Langenhagenê va piştevaniya darayî werdigire.

Landeshauptstadt Hannover | LANGENHAGEN bewegt | STADT LEHRTE | Region Hannover

# BIZANE KU ÇI DERBAS DIBE MENDEHOŞÎ Û XETER

## Li navenda lêhûrbûnê: **Gaza kenê**

| | |
|---|---|
| Xetereyên giran & dûhatên demdirêj | • <u>Xetereyên giran:</u> Kêmbûna oksîjenê ku renge bibe sebeb bêhûşbûnê û di encamê de zirar û ziyanê pêk tîne.<br>◦ Di rewşa bikaranîna rasterast a kepsûla gazê de ev xetere heye ku hin qersîîn li devera devî û hin pifile ji ber qerisînê li destan pêk bên.<br>◦ Ziyanên li pişikê ji ber pirjîna nişkêvayî ya vê gazê.<br>• <u>Dûhatên demdirêj:</u> Bikaranîna berdewam xetera ziyayên mejiyê hestiyan yan jî pergala rehan zêdetir bike<br>• Zirarên rehnasiyê dibe ku bandora nerênî li ser kontrona masûlkeyan jî bikin<br>• Bandora nerênî li ser hilmijîna Vîtamîna B12 dike. |
| Pêşîlêgirtin & Şîret | • Bikaranîna ewleh<br>◦ Rawestan navbera yekeyên bikaranînê<br>◦ Tu wextî rasterast kepsûla gazê bi kar neyîne, ji ber ku dibe ku pifileyên çermî ji ber qerisînê pêk bîne<br>◦ Di rewşa razayî yan rûniştî da bêhn bikişîne da ku rê li ber birîndarbûnên ji ber lêketina li erdê bigirî.<br>• Rûbirrûbûn digel bikarhêneran<br>◦ Bikarhêneran ji wê rewşê derxîne<br>◦ Danîna têkiliya zelal<br>◦ Li ser hemdê xwe bimîne<br>◦ Heke pêwîst e destûra lênihêrîna bijîşkî bide da ku kêmasiyên gengaz nas bikî<br>◦ Piştre divê li ser rewşê careke din axaftin were kirin.<br>• Hypeculture'ê têkildarî gaza kenê vîdyoyek çê kiriye ku bi awayê lezgîn û hêsan haydariyê dide.<br>• Navenda Fêrkariya Bilind a Bijîşkî ya Hannover'ê dibistanan wek berpirssa kişandina balê bo ser xetereyên madeyên hişber dizane. |
| Estatîstîk | • Rêveberiya Polîsê Sizayî yê Federal (BKA) gaza kenê wek alîgiriyeke berdewam dinirxîne ku dibe ku ziyanên tenduristiyê yên giran li pey xwe bîne. Pêştir 11 babetên mirinê di sala 2023an de hatine tomarkirin ku dikarin digel gaza kenê pêwendiya wan hebe. |


**Quellen**

https://paritaetische-suchthilfe-nds.de/infosammlung/lachgas-wir-klaeren-auf/ (Destragihîştin: 10.10.2025)
https://mindzone.info/substanzen/lachgas/ (Destragihîştin: 10.10.2025)
https://www.bundesgesundheitsministerium.de/presse/pressemitteilungen/bundeskabinett-beschliesst-lachgasverbot-pm-01-07-25.html (Destragihîştin: 09.10.2025)
https://www.drugcom.de/drogenlexikon/buchstabe-l/lachgas/ (Destragihîştin: 10.10.2025)
https://www.drugcom.de/haeufig-gestellte-fragen/fragen-zu-lachgas/ist-der-besitz-von-lachgas-legal/ (Destragihîştin: 23.10.2025)
https://www.nichtzumlachen.de/ (Destragihîştin: 13.10.2025)
https://www.youtube.com/watch?v=EN-1upgg98w (Destragihîştin: 13.10.2025)
https://www.mhh.de/presse-news/lachgas-ist-keine-harmlose-partydroge-erwerb-muss-gesetzlich-besser-geregelt-werden (Destragihîştin: 13.10.2025)
https://www.bka.de/DE/AktuelleInformationen/StatistikenLagebilder/Lagebilder/Rauschgiftkriminalitaet/2023/BLB_RG_2023.html (Destragihîştin: 09.10.2025)



PRO Langenhagen

Ev belgeya ragihandinê ji aliyê Konseya Şopandinê ya Langenhagenê va piştevaniya darayî werdigire.

Landeshauptstadt Hannover | LANGENHAGEN bewegt | STADT LEHRTE | Region Hannover